

## Şoreşa Sûriyê li ku ye?

Ş. Dado

**D** îroka Sûriyê ya nûjen tijî ye ji nakokiyên navxweyî. Ji bo destxistinakarbedestîya dewletê li beramber destdirêjîyên hêzên cîhanî - bêgûman dûrî maf û berjewendiyên gel an bikaranîna demokrasiyê û mafên mirovan - di dema ku partiyên siyasî, îdolojî û totalîter bûn ji bilî partiya Kurd li Sûriyê ya ku, ji roja damezrandinê ve (14 Hizêran a 1957 an), dirûşma demokrasiyê û mafên mirovan bilind kiribû, nemaze di heyama şerê sar de, parta Be'is ya ku li ser îdolociyê û ramana netewî avabûye, di 8 Avadara 1963 an de, destê xwe danî ser destlata dewletê û siyaseta tekpartî birêvebir, li dijî hêzên dî rêça tunekirin, zîndankirin, tund û tûjî, û li serê Kurda siyaseta şoven û nijadperestiyê bikaranî.

Ango, rêjîmek stemkar û nedemokrat li dirêjahiya nêzî pênç salî di Sûriyê de avabûbû, ya ku bi xwe re pir astengên siyasî, civakî, aborî û çandî anî, bê ku çirûskên guhertin an çareserkirinê hebin, ta ku Sûriyê gihişte vê rewşa nuha ya nazik û tarî, ya ku alava tund û tûjî navnîşana wê ye, Mîna kuştin û şehîdbûna bêtirî yanzde hezar kesan, birînîkirin, koçberkirin, girtin û zîndankirina deh hezer kesan.

Kiryarên rijîmê li dijî xelkê Sûriyê bêtirî salekê ji temenê şoreş a pîroz, pileya ( tewanbariyên li dijî mirovahiyê ) derbas

kirine. Yên ku pir raghandin, rêxistin û hêzên hundir û derve, cureyên wê dîtine û bi nav kirine, lêkolîn û belge li ser çêkirine, bi taybetî komîta mafên mirovan ya Neteweyên Yekbûyî û raporên berdevka wê xanim Nafî Bîlay a ku daxwaz kiriye ku Encûmena ewlekariyê ya navdewletî bilez bilive û zorê bide ser rijîma Sûriyê, da ku, darê tundiyê, kuştin û lêdanê rawestîne, û berpirsiyarên wê li pêş Dadgeha Cînayeta navdewletî werin gunehkirin. Lê, ji ber Vîtoya Rûsiya û Çînê, wê Encûmenê di çerçewa tevliheviya nakokî û berjewendiyên herêmî û navnetewî de nikaîbû tiştê bike. Ji alîkî din ve, piştî herikandina xwîne û malwêrankirina xelkê bi destê hêz, leşker û dûvçilkên ( şebîhên ) rijîma zordar ya ku, di ûstandinabi vê rewşa nû re ji bilî rêbaza ewlekarî - leşkerî, lêxistin û kuştinê, tiştê din naşopîne,... Nema dem paşve vedigere û kîjan rojê be wê Şoreşa Azadî û Rûmetê bi ser keve . Lê mixabin, digel keftelefa Kofi Enan, tu çareserî balkêş û rast, di demek nêzîk de , ne xuya û ne jî aşkere ye ku wê qelengê serkeftina serhildana gelê Sûrî bilind be, ji ber hin **D.R. (11)**

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de*